Kurmandji

9

Îlon
2018

MAFÊ DEBNGDAYÎNÊ.

Hilbijartina parlimanê, Konseya navçeyî / Konseya deverî û Konseya Bajêr!

Gelo **tu welatiyê Swêdê yî**? Bes tu dikrî li hilbijartina Parlimanê beşdar bibî.

Gelo tu bi qasî **3 salan** li Swêdê hatiyî tomarkirin? - Bes tu dikarî li hilbijartina **Konseya Bajêr û navçeyê / deverê dengê xwe bidî.**

Temenê te dive herîkêm **18 salî** be!

Heke tu welatiyê Swêdê lê rûniştiyê welatekî din bî jî dikarî li vê hilbijartinê dengê xwe bidî. Di rewşeka visa da divê dengê xwe bi riya posteyê va bişînî.

ÇIMA DIVÊ KUEZ DENGÊ XWE BIDIM?

Dengê te girîng e!

- Heke tu dengê xwe negihînî guhê kesên din, kesên din bêdengiya te neçê bi kar tînin!
- Asta destheqa jinan sedî 88ê mêran e, ji her pênc jinan kesek di heyama temenê xwe da ketiye ber destdirêjiya tund a cinsî, jin di salê da 260 saetan zêdetir ji mêran Karê malê yê bêyî destmizdê dikin.
- Jinan mafê xwe yê dengdayînê ji 99 salan beriya niha va bi dest xistine. Dengê xwe bona guhertin û Bandordanînê bi kar bîne!
- Jibo hebûna civakeka baştir, bo xwe, xwîşkên xwe û keçikên xwe dengê xwe bide! Dengê te bênav e û tu kesek fam nake ku tu dengê xwe daye kî/kê.
- Dengê te girîng e!

Ez çawa gereku dengê xwe bidim?

Cihê dengdayîna xwe nas bike û xwe hevrê digel dapîr, dayîk, xwîşk, keçik, keç-dosta xwe her wir!

Navnîşan û saeta xebatê ya navendên dengwergirtinê li ser karta ku bo navnîşana te ya tomarbûyî li Ofîsa Tomarkirinê hatiye şandin, hatiye nivîsîn.

Karteka naskirinê ya pêbawerkirî weke bawernameya ajotinê, karta naskirinê ya dayî ji aliyê bankê an belgeyeka wisa bi xwe ra bibe.

Di roja hilbijartinê da dikarî bi awayê xwebexş karta xwe ya dengdayînê bi xwe ra bînî, lê jibo dengdayîna zûdem.

Divê hem karta te ya dengdayînê û hem karta naskirinê hebe.

Lîsteya partiyan li navenda dengdayînê ku li wir biryar e dengê xwe bidî, hatiye nivîsîn. Ji bîr neke ku tu dikarî li sê hilbijartinên cuda dengê xwe bidî: Hilbijartina parlimanê, hilbijartina Konseya Deverê/navçeyê û hilbijartina konseya tax/bajêr.

Tevahiya partiyan berendamên xwe li lîsteya dengwergirtinê tomar kirine. Rêzbendiya nivîsîna navê wan diyar dike ku dê çi kesek bê bijartinê. Heke dixwazî dikarî bi nîşankirina xaneya li ber navê kesên têkildar, dengê xwe bidî wan. Heke ti navekî nîşan nekî, dengê te bo kesên jortirê tê terxankirin.

Dengwergirtin bi awayê nenas pêk tê! Ti sînordariyek li hejmara belge/bilêta dengê ku dixwazî bavêjî sindoqê tune. Tu lîsteya partiya ku dixwazî dengê xwe bidî wê, li nav pakêtê û derê wê girê didî. Piştra sê paketên dergirtî û bênav radikî û ji cihê sindoqê dengdayînê têyî derê.

Belge/bilêtê dengdanê bi sê rengê cuda jibo sê hilbijartinan e: Bilêta Zer jibo parlimanê, bilêta Şîn jibo konseya dever/navçeyê û bilêta Sipî jibo Konseya Bajêr. Tu dikarî li her hilbijartinekê dengê xwe bidî partiyeka cuda.

Di dawiyê da, serî li berpirsekî dengwergirtinê bide û navê xwe tomar bike. Piştra pakêtê bavêje nav sindoqê (valurna)

Navê te ji ber vê yekê tê tomarkirin ku tenê carekê bikarî dengê xwe bidî. Helbet kesek pê nahese ku te dengê xwe daye kîjan partiyê.

Heke nikarî di roja hilbijartinê da dengê xwe bidî baştir ev e ku vî karî zûtirkê pêk bînî. Ji 18 rojan beriya roja Hilbijartinê dikarî vî karî bikî. Dengwergirtina zûdem li navendên dengwergirtinê yên diyarkirî cih tê. Navnîşana van navendan li malpera şaredariyê hatiye nivîsîn.





- Parliman saziya herî bilind a biryarder li welêt e. Endamên parlimanê di roja hilbijartinê da tên bijartin. Tevahiya partiyên ku zêde ji sedî 4ê dengan bi dest bixin, li nav parlimanê dibin xwedan kursî.
- Partî an partiyên ku zêdetirîn dengê werbigire/werbigirin û li hilbijartinê bi ser bikevin, dewletê dadimezirîne/in. Erka dewletê cihanîna siyasetan e.
- Partî an partiyên ku dewletê dadimezirînin, wezîran diyar dikin û li ser çalakiya rêvebiriyan çavdêriyê dikin.

Wezaretxane wek yekîneyê tevdigerin û siyasetên cûrbicûr cih tînin. Wek mînak wezareta perwerdehiyê berpirsa cihanîna siyasetên perwerdehiyê ye. Wezaretxane her wiha berpirsa çavdêriya li ser saziyên dewletê ne.

- Rêxistinin weke ”Sêrvîsa Kar û Pêşeyê” an ”Desteya Koçberiyê” xizmetin taybet ji bo kesên ku rûniştiyê Swêdê ne, tayîn û raber dikin.
- Hilbijartina parliman, Konseya Dever/navçeyê û Konseya Bajaran her 4 salan carekê tê lidarxistin.

Hilbijartina ”Parlimana Ewropayê” her 5 salan carekê tê lidarxistin. Dora din a hilbijartina Parlimana Ewropayê dê sala 2019an bê lidarxistin.

- Partiyên dijber ên derveyî dewletê, mêdya (Ku serbixwe ne) û Civat (Weke Koma Jinên Swêdê) li ser tevgeriyana dewletê zîrevaniyê dikin.

Dewleta Swêdê soz daye ku ji riya şeş armancên hûr û biçûk beranberiya zayendî anku cinsî bixe meriyetê:

1. Berbelavkirina yeksan a desthilat û bandorê.
2. Bernaberiya aborî.
3. Perwerdehiya beranber.
4. Berbelavkirina yeksan a kar û miqatebûna nav malê ya bêyî destmizdê.
5. Xizmetên dermanî yên beranber.
6. Rawestandina tundiya mêran li dijî jinan.

Ev armanc di rewşekê da serê xwe digirin ku em wan di hemî çalakiyan da berçav bigirin.

Ez têgihîştim! Lê ez zanatiyên zêdetir ji ku

Regeringen.se
Riksdagen.se
Valmyndigheten.se
UR.se
SVT.se
SR.se
Alkompis.se (Nûçeyên Erebî)
kvinnofridslinjen.se
sverigeskvinnolobby.se

Tu biryar didî dengê xwe bidî kîjan partî û kîjan siyasetvanî û ev mijareka kesane ye.

PARTIYÊN PARLIMANÊ:

- www.vansterpartiet.se
- www.socialdemokraterna.se
- www.mp.se
- www.liberalerna.se
- www.centerpartiet.se
- www.moderaterna.se
- www.kristdemokraterna.se
- www.sd.se

Tevahiya bajar, navçe, konseyên navçe û saziyan/Rêvebiriyan xwedan malper in. Ev malper xwedan zanyarî li bara mafên te, xizmetên ku girêdayiyê te ne û şert û mercên têkildarî wan e.

SVERIGES KVINNOLOBBY

SVENSKA POSTKOD STIFTELSEN

Kurmandji

PIRSGIRÊK	Vänsterpartiet	Socialdemokraterna	Miljöpartiet	Liberalerna	Centerpartiet	Moderaterna	Kristdemokraterna
Pêşniyara partiyan ji bo ewlehiya hemû keç û jinan di cihên giştî de û pêşgirtina ji tundiya dijî wan û tundiyên fîzîkî.	Qanûna rizayetê. Rêkara netewî ya têkoşîna destdirêjî û tundiya cinsî. Hemû bûyerên kuştina jinan ji aliyê xizmên nêzîk ên nêr ve yê li ber çavan re bên derbaskirin. Danasîna perwerdeya parastina fîzîkî ya jinan li dibistanê. Qedexekirina propagandayên têkildarî cidahiya cinsî. Çaksaziya kualîteya perwerdeya mijarên cinsî û pêwendiyên nêzîk.	Qanûna rizayetê. Zêdekirina bûdceya polês.	Qanûna rizayetê. Divê mafê polês ê çavdêriya biwêne hebe. Zêdekirina bûdceya polês. Pêşniyara şopandina baştir ji bo bicihkirina biryarên qedexeyê. Hewl pêşîgirtinê li dibistanê.	Zêdekirina hejmara hêzên polês. Dabînkiirna bûdceya hêzên bajaran ên ewlehiyê. Hewl pêşîgirtinê li dibistanê.	Zêdekirina hejmara hêzên polês. Zêdekirina bûdceya têkoşîna li dijî şidetên cinsî li cihên giştî. Zêdekirina cezayê mecbûriya cinsî. Xurtkirina kêrhata xetên dayîmî ji bo çareserkirina pirgirêkên keç û jinên mexdûr. Çaksaziya kualîteya perwerdeya mijarên cinsî û têkiliyên nêzîk.	Zêdekirina hejmara hêzên polês. Divê mafê polês ê çavdêriya biwêne hebe. Hewlên pêşîgirtinê li dibistanan.	Zêdekirina hejmara hêzên polês. Divê mafê polês ê çavdêriya biwêne hebe. Hêzên polêsê înternetî. Zelalkirin wateya sûcê reşkirina navan di torên civakî de. Belavkirina nivîsên biçûkkirinê jî divê bê qedexekirin.
Pêşniyara aliyan ji bo amadekirina vegerîna jinên ku ji bazara kar derketine, bo ser kar û serxwebûna wan ji hêla aborî ve.	Hûrbûna li ser perwerdeyê. Çaksaziya çalakiya ofîsa kar. Sermayeguzariya di warê rehetiyê de ji bo zêdekirina derfetên kar.	Hûrbûna li ser xwendin û perwerdeyê. Birêkûpêkkirinên wek karên mukemel û çêkirina derfetên ticarî yên nû.	Pêvajoya venêrîna li daxwaza jin û mêran a ji bo penaberiyê divê wekhev be. Zêdekirina hejmara navendên perwerdeya teknîkî yên mezinan. Zêdekirina hejmara dibistanên seretayî yên xwedî derfetên pewerdeya zimên. Sîstema cubrankirina mirexesiya dê û bavan di saziyên aborî de, bi awayekî ku xeybeta dê û bavên ku di malên xwe de zarokan xwedî dikin, divê her roj pereyê xwe bistînin.	Şaredarî divê dewreyên perwerdeya zimanê swêdî ji bo dê û bavên di mirexesiyê de berçav bigire. Çaksaziya çalakiyên ofîsa kar. Çêkirina reformên RUT'yê.	Karên asta bingehîn- karên sade bi mûçeya kêmtir. Rakirina maliyata mûçeyê di 2 salên destpêkê de. Çêkirina reformên RUT'yê. Sînordarkirina alîkariya aborî ji bo dê û bavên ku bi zarokên xwe re tên Swêdê, ji bo sahîkirina wê li gor temenê zarokan. Hêsanbûna şert û mercên birêzxistina debarê, bi navê "Şîrketa Asta Seretayî". Danasîna alîkariya aborî ya SFU ji bo dayîna mûçeyê li gor kêrhatê.	Karên asta bingehîn – karên sade bi mûçeya kêmtir. Kêmkirina maliyatê ji bo kesên xwedîkar, bi taybet kesên ku ji hêla aborî ve lawaz in. Nasandin sînordarkirina aîkariya civakî. Berfirehkirina heqê pêş-dibistaniyê ji bo dê û bavên xwedî alîkariyên debarê. Nasandina dewreya neçarî ya nasandina civakî ji bo kesên nûhatî.	Pêwîstiya hewla dualî bi şeklê perwerdeya zimanê û perwerdeya teknîkî ji bo jinên ku daxwaza alîkariyê dikin. Pêwîstiyên taybet ên xwendina SFI, nasandina civakî û derdestbûna bazara kar di warê radestkirina daxwaza penaberiyê, di heyama berçavgirtina alîkariya aborî ya rojane. Pêwîstiyên çalakiya ji bo kesên li pey alîkariyên aborî yên mukemel, û bîmeya dê û bavan.

Kurmandji

PIRSGIRÊK	Vänsterpartiet	Socialdemokraterna	Miljöpartiet	Liberalerna	Centerpartiet	Moderaterna	Kristdemokraterna
Pêşniyara partiyan ji bo pêşîgirtina ji sinetkirina jinan û sîgortekirina darizandina sûcdaran.	Nasandina zêdetir a pergala dermanî û dermankirinê. Nirxandina pêwîstiya hewlên netewî di warê alîkariya ji bo jinên kêmendam di beşa dermankirinê de.	Zêdekirina çavkaniyên polês. Agahkirina kesên nûhatî li bara qedexekirina sinetkirina keçan li Swêdê.	Nasandina zêdetir a pergala xizmetên dermanî. Bernameya piratîkî ya têkoşîna dijî sinetkirina keç û jinan. Agahkirina kesên nûhatî li bara qedexekirina sinetkirina keçan li Swêdê.	Agahkirina li bara xizmetên dermanî, pergala dadê, dibistan û xizmetên civakî. Zêdekirina çavkaniya hewlan têkoşîna dijî tundiyên namûsî. Agahkirina kesên nûhatî li bara qedexekirina sinetkirina keçan li Swêdê.	Serperiştên ku nikaribin pêşî li sinetkirina keçan bigirin divê bên darizandin. Qurbanî di pîvajoya dadê de ti carî nayên nasandin.	Lêkolîna li bara bêkêrbûna qanûnan.	Dayîna destûrên bijîşkî li welêt ji bo îlankirina vê yekê ku sinetkirina keçan li Swêdê qedexe ye.
Pêşniyara partiyan ji bo bidawîkirina zewaca zarokan.	Qedexeya habûna keysên awarte ji bo zewaca zarokan. Rênimayiyên nû li bara berteka berpirsan li hember zewaca zarokan li derveyî Swêdê.	Parastina biyaniya li hember zewaca zarokan.	Hêsankirina pêvajoya alîkariya ji bo zarokên zewicî li derveyî Swêdê, li bara vegera bo welêt û betalkirina zewaca zarokên ku piştî hatina Swêdê zewicî ne.	Qedexeya habûna keysên awarte di qanûnê de ji bo zewaca zarokan. Daxwaz yan hewlên xapandinê ji bo neçarîkirina seferên têkildarî zewacên neçarî divê bên qedexekirin. Nirxandina hewlên saziyên çalak ên di warê têkoşîna dijî zewaca zarokan li derveyî Swêdê û pêşgirtina li hatina bo nava Swêdê.	Pêşîgirtina dayîna bûdceya giştî bo ol û ayînên ku rê li zewaca zarokan vedikin. Qanûna parastin-pêşîgirtina demkî ya pasporta zarokan di dema ku îhtimala derketina wan li welêt ji bo zewacê heye. Kesên ku zarokan ji bo vî karî han didin divê vên cezakirin. Damezirandina navendekê ji bo alîkariya zarokên ku li derveyî Swêdê neçarî karên wek zewacê tên kirin. Hewlên alîkariyê li dibistanan.	Qedexeya habûna keysên awarte ji bo zewaca zarokan.	Qedexeya habûna keysên awarte di qanûnê de ji bo zewaca zarokan. Sînordarkirina seferan ji bo malbatên ku divê cihê jiyana endamên xwe ragihînin.
Pêşniyara partiya ji bo guherandina rewşa belavkirina newekhev a karê bêpere di nava jin û mêran de.	Bîmeya yekkesî ya dê û bavan. Kêmkirina giştî ya saeta kar.	Bîmeya yekkesî ya dê û bavan. Pejirandina karê giştdemî wek erf. Pêşîgirtina ji peymanên bikargirtinên bêewle ji bo jinan.	Bîmeya sêbeşî ya dê û bavan.	Sererastkirina bîmeya dê û bavan. Belavkirina derfetên wekhev li dibistanan.	"Xelata Derfeta Beramber" ji bo hêsankirina mirexesiya dê û bavan. Xelata VAB ji bo beavkirina wekhev berpirsiyariya parastina zarokan.	Qusûrên RUT sê-qat.	Berbelavkirina sermayeguzariya di xizmetên RUTê de.

* Ji partiyên demokrat û femenîst ên Swêdê hatibû xwestin ku bersiva van pirsan bidin, lê ti bersivek nehat